K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

PROJEYA LÎSANSA BÊTEZ

LI GOR RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN YA VLADîMÎR PROPP ANALÎZA SÊ ÇÎROKÊN KURMANCÎ

Nurcan Özdoğan
19721010

Şêwirmend:
Doç.Dr. Mustafa Öztürk

Mêrdîn, 2020

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

PROJEYA LÎSANSA BÊTEZ

LI GOR RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN YA VLADîMÎR PROPP ANALÎZA SÊ ÇÎROKÊN KURMANCÎ

Nurcan Özdoğan
19721010

Şêwirmend:
Doç.Dr. Mustafa Öztürk

Mêrdîn, 2020

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu ÜniversitesiLisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Li Gor Rêbaza Analîza Çîrokan Ya Viladîmîr Propp Analîza Sê Çîrokên Kurmancî " adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin/Projemin … yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../...

Öğrencinin Adı Soyadı:

Nurcan Özdoğan

KABUL VE ONAY

Nurcan Özdoğan tarafından hazırlanan **LI GOR RÊBAZA *ANALÎZA ÇÎROKAN* YA VLADîMÎR PROPP ANALÎZA SÊ ÇÎROKÊN KURMANCÎ**, adındaki çalışma .../.../......tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS PROJESİ** olarak oybirliği / oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

NAVEROK

DESTPÊK 1

BEŞA YEKEM 2

1. JIYANA VLADÎMÎR PROPP 2

1.2. RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN YA VLADÎMÎR PROPP 3

BEŞA DUYEM 6

2. METNA ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ 6

2.1. ANALÎZ 7

2.2. ŞEMA 8

2.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ 8

2.4. VEBÊJERA ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ 8

3. METNA ÇÎROKA HEBHINARKÊ 9

3.1. ANALÎZ 12

3.2. ŞEMA 13

3.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA HEBHINARKÊ 13

3.4. VEBÊJERA ÇÎROKA HEBHINARKÊ 13

4. METNA ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ 14

4.1. ANALÎZ 20

4.2. ŞEMA 21

4.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ 22

4.4. VEBÊJERÊ ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ 22

ENCAM 23

ÇAVKANÎ 24

KURTE

Teoriya Binyadger weke bingeh xwe dispêre xebatên zimanzaniyê. Ew bêtir liser bingeha metnan disekinin. Binyadgerparêz pêşî li herêmeke diyar dest bi lêkolînên xwe dikin pişt re jî binyadekê derdixin holê. Ew vê binyada ku derketiye holê dixin teşeyekê û di asteke navnetewî de bi kar tînin. Bi vî awayî dixwazin derxin holê ku gelo afirandinên edebiyata gêlerî ku berhemên ramana mirovan in, bi çi rengî geş dibin û bi çi awayî pêş dikevin.Viladimir Popp analîza xwe ya çîrokan dispêre xebatên Binyadgerîyê. Propp xebata xwe ya derbarê çîrokan de liser du beşan dimeşîne: fonksîyon û rol. Li gor wî 31 fonksîyonên çîrokan hene û di çîrokan de heft rol derdikevin pêş. Di vê xebatê de ez ê li gor rêbaza binyadger ya analîza çîrokan ku Vlademîr Propp afirandiye, li ser çîrokên " Tiltilîş û Bilbilîş, Hebinarkê û Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî" bisekinim. Ez ê hewl bidim li gor rêzikên vê pergala analîzê, van çîrokan analîz bikim.

Kurtebêje: çîrok, analîz, fonksîyon, rol, Propp.

ÖZET

Biçimbilim Teorisi kaynağını dilbilim çalışmalarından almıştır ve bu teori daha çok metin yapısının temel özellikleri üzerinde durmaktadır.Yapıbilimciler öncelikle belirli bir alanda ya da belirli bir anlatım gurubu üzerinde incelemeler gerçekleştirirler. Sonrasında ise ortaya bir yapı çıkar. Onlar bu yapıyı formülize edip uluslararası bir ölçekte pratikleştirirler. Bu şekilde halkbilimi edebiyatı yaratılarının, ki insan düşüncesinin yaratımlarından kaynağını almaktadır, ne şekilde gelişip ilerlediğini ortaya çıkarmaya çalışmışlardır.Viladimir Propp masal analizlerini Biçimbilimine dayandirmaktadir. Propp masala yönelik çalışmalarını iki özellik üzerinden yönetir: Fonksiyon ve rol. Ona göre masallarda 31 fonksiyon vardır ve bu masallarda 7 tane öne çıkan rol vardır. Ben bu çalışmam da Propp'un yarattığı yapıbilimci masal analizi çerçevesinde " Tiltilîş û Bilbilîş, Hebinarkê û Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî" kürtçe masalları üzerinde durup bu sistem çerçevesinde masalların analizini yapmaya çalışacağım.

Anahtar kelimeler: çîrok, analîz, fonksîyon, rol, Propp.

ABSTRACT

The Theory of Structural Science has its origins in linguistic studies and this theory focuses more on the basic features of text structure. Structural scientists primarily conduct studies on a specific field or a specific group of narratives. Then a structure emerges. They formulate this structure and make it practical on an international scale. In other words, they form the 'grammar of the creations of folklore literature'. They use the skeleton of this grammar in text reviews and comparative studies. In this way, they tried to reveal how folklore literature develops and progresses, which is rooted in the creations of human thought. Propp manages desk-oriented work through two features. Function and role. According to him, there are 31 functions in fairy tales and 7 prominent roles in these tales. In this work, I will focus on "Tiltilîş û Bilbilîş, Hebinarkê û Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî" Kurdish tales within the framework of the constructivist tale analysis created by Propp and try to analyze the fairy tales within the framework of thissystem.

Keywords: tale, analysis, function, role, Propp.

DESTPÊK

Di derbarê dîroka çêbûna çîrokan de mirov nikaribe xwe bigihîne agahîyeke teqez jî em dizanin ev dîrok dîrokeke pir kevn e. Çîrok bi armancên cuda hatinin gotin û veguheztin. Em berê xwe bidin kîjan kom an civakê em ê bibînin ku di nava jiyana wan de çîrokê ji xwe re cîhek veqetandiye. Di demên kevn ku teknolojî û ragihandin ewqasî bi pêş ve neketibû, çîrokan roleke girîng di nava civakê de dilîstin. Hin caran dibûn qidamên şevbihêrkên şevên dirêj yên zivistanê, hin caran dibûn amûreke xweşderbaskirina demê, û hin caran jî dibûn navbeynkarên perwerdeyê ji boy zarokan û roleke pedegojîk bi cîh dianîn. Bi destpêkirina nivîsê re çîrok gîhan merheleyeke din, ew êdî ji wendabûnê hatin rizgarkirin û qedera wan êdî ne tenê di destê hafizayê de bûn. Yanî bi jibîrkirina vebêjer re ew jibîr an wenda nedibûn. Xebatên folklorîk ji boy hemî civakan xaleke girîng e, lê ev girîngî ji boy civakên kêmar û kolonî hinekî din xwe derdixe pêş. Gelek caran civakên bindest berhemên folklorîk ji boy îspata hebûna xwe dikin delîlên etnîkî, delîlên kevnarbûna dîroka xwe. Di dîroka kurdan de jî gelek xebatên folklorîk bi rêya kovar, komel, rojname û kesayetan ve hatinin kirin. Hawar, Ronahî, Rojî Kurd, Tîrêj, Jîn, Rewşen, Vate û hw. hin ji van weşanan in (Keskin, 2019: 92). Van weşanan di gel xebatên folklorîk bi taybet cîh danin berhevkariya çîrokên kurdî jî. Dîsa kesayetên wek: Mela Mahmûdê Bazidî, Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Kemal Fewzî, Fûad Temo,Babê Reşo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û hw. di xebatên derbarê çîrokan de roleke girîng hilgirtine (Yildirm, Pertev, Aslan:2013). Van xebatan di berhevkirin û arşîva çîrokan de kedeke mezin dane, lê li cîhanê êdî digel xebatên berhevkarî û arşîvkirinê, bi awayekî zanist nêzîkatî li çîrokan hatiye kirin. Vlademîr Propp jî pêşengê vê rêbazê ye. Ez ê di vê xebatê de bi rêbaza zanist ya V. Propp sê çîrokên kurmancî analîz bikim. Rêbaz: Bi pêşketina dem, teknolojî û nivîsê re nêrîna li hember çîrokê jî hatiye guhertin. Êdî bi awayekî zanistî nêzîkatî li çîrokan têye kirin, rê û rêbazên zanistî tê şopandin. Li gor Vlademîr Propp çîrok xwedî taybetiyên gerdûnî ne û di hemî çîrokan de heman rê û rêbaz hatinin şopandin. Rola karakteran û fonksîyona çîrokan di hemî çîrokan de dişibin hev u du. Propp 31 fonksîyon û 7 rol diyar kirine û analîza çîrokan jî li gor van xalan dike. Ez ê jî van rêbazên Propp ji xwe re bikim rêber û li gor vê rêberê ez ê hewl bidim çîrokên Tiltilîş û Bilbilîş,

Hebinarkê û qîzika Sêwî analîz bikim. Ez ê di vê xebatê de dernekevim dervî qaîdeyên zanistî û ez ê ji ber şert û mercên pandemîyê bi rêya înternetê xwe bigihînim çavkaniyên pêwist. Astengî: Ji ber rewşa Pandemîyê ez nikarim xwe bigihînim hin çavkaniyan, ev di warê xebatê de ji min re hin astengîyan çê dike. Girîngiya Xebatê: Bi vê xebatê re ez ê hewl bidim bi awayekî zanist analîza sê heb çîrokên kurmancî bikim û van çîrokên kurmancî li nav çîrokên kurmancî, ên ku bi awayekî zanistî hatinin lêkolîkirin zêde bikim. Sînor û Çarçove: Ez ê vê xebata xwe li gor rêbazên zanist yên Propp çêbikim, rê û rêbazên Propp, ên ji min re bibin rêber. Mijar: Analîza Çîrokên Tiltilîş û Bilbilîş, Hebhinarkê û Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî

BEŞA YEKEM

1. JIYANA VLADÎMÎR PROPP

Vladimir Propp di serî de pisporek folklorê ye. V. Propp, ku li Beşa Fîlozofiya Slavî ya li Petersburgê, li bajarê ku lê jidayikbûye, xwendiye û beşdarî xebata kolektîf a S.A.Vengerov a li ser Pûşkîn bûye, ku ji bo wê heyamê ev tiştekî girîng dihat hesibandin (ku nûnerên herî girîng ên dibistana formalîstan li vê derê gîhaştine), di 1918an de, piştî ku xwendina xwe qedandiye, wî li dibistanên cûrbecûr dersên Ziman û Wêjeya Rûsî dane. Paşê li Zanîngeha Lênîngradê dersa Elmanî daye û li ser vê mijarê hin lêkolîn weşandine. Dûv re ew bi folklorê re eleqedar bûye û li Zanîngeha Lenîngradê dersên etnolojiyê daye. Digel ku V. Propp di serdema Formalîzma Rûsî de xebatên xwe dane jî, wî bi têgihiştinek ku dê bingehên strukturalîzmê bavêje berhemên xwe nivîsandine. Ji ber vê yekê, ew ji hêla rêbazê ve yek ji kesê bi bandor dê strukturalîstên Fransî bûye. Di nav xebatên wî yên sereke de ev henin:

- Morfolojiya Çîrokê (1928),
- Çavkaniyên Dîrokî yên Çîrokên Awarte (1946),
- Helbesta Destanî ya Rûsî (1955). (Berhevok.2010.)

1.2. RÊBAZA ANALÎZA ÇÎROKAN YAVLADÎMÎR PROPP

Vlademîr Propp dema ku çîrokên gelêrî yên rûsî lêkolîn dike, lê hayil dibe û dibîne ku mijarên çîrokan çiqas cuda bin jî, ew ji aliyê binyadê ve xwedîyên metodên heman in û ew metod naguherin. Propp lê hayil dibe ew dikare bi metoda F.Saussure ku metoda 'Lêkolîna Zanista Ziman' e, ew dikare rêzikên binyada çîrokên gelêrî derxe holê. Bi vî rengî ew biryar dide bi vê şêwazê, fonksîyon û yekeyên ku dikare bibe hevpariya bi hezaran çîrokan, derxe holê. Yase û binyadên çîrokan ên ku naguhere diyar bike. Propp paşî bi vê şêwazê çîrokên cîhanê jî lêkolîn dike. Bi berawirdkirina çîrokên rûsî û çîrokên cîhanê ew 31 fonksiyonên neguherbar dibîne" (Kuzucular,2013). "Li gor tespîta Propp di çîrokekê de temamî 31 fonksiyonan yan jî pirî van fonksiyonan dikare cîh bigire. Bê gûman di hemî çîrokan de ev fonksiyon tev, dibe ku tunebe jî. Lê kêmaniya fonksiyonekê an du fonksiyonan, di hin çîrokan de cîhnedana hin fonksiyonan, rêza van fonksiyonan ya di çîrokê de û pergala derketina wan ya di rêzebûyerê de naguherîne (Kuzucular,2013)."31 fonksîyonên Propp ev in:

1. Kesek ji malê dûr dikeve. (Pênase: dûrketin, sembol ß)

2. Leheng rastî qedexeyekê tê. (Pênase: qedexekirin, sembol γ)

3. Qedexe tê binpêkirin. (Pênase: binpêkirina qedexeyê, sembol δ)

4. Êrîşker dixwaze agahiyan bi dest bixe. (Pênase:lêpirsîn, sembol ε)

5. Êrîşker derheqê qurbanê xwe de agahiyan bi dest dixe. (Pênase:berhevkirina agahiyan, sembol ζ)

6. Êrîşker ji bo ku qurbanê xwe an jî serweta wî dest bixe rêya xapandinê diceribîne. (Pênase:xapandin, sembol η)

7. Qurban tê xapandin û bêhemdê xwe arîkariya dijminê xwe dike.(Pênase: tevlîbûna tawanê, sembol θ)

8. Êrîşker ziyanê dide yekî ji malbatê. (Pênase:xerabî, sembol A)

9. Nûçeya xerabî an kêmaniyê belav dibe; bi daxwaz an jî bi fermanê serî li leheng tê dayîn, leheng tê rêkirin an jî izna çûyina wî tê dan.(Pênase:navbeynkarî, dema derbasbûnê, sembol B)

10. Leheng peywirê qabul dike an jî biryara destpêkirina tevgerê dike. (Pênase: destpêkirina tevgera dijber, sembol C)

11. Leheng ji mal vediqete.(Pênase:çûyin, sembol ↑)

12. Leheng ji bo ku amûreke sêhrî an jî arîkarekî dest bixe rastî serboriyekê (ezmûn, lêpirsîn, êrîş…û hwd.) tê. (Pênase:fonksiyona pêşî ya bexşîner, sembol D)

13.Leheng ji bo tevgerên kesê ku wê di dahatûyê de bexşekê bidê (bexşîner) bertekê nîşan dide. (pênase: berteka leheng, sembol E)

14. Heybera efsûnî didin leheng. (pênase: stendina heybera efsûnî, sembol F)

15. Leheng digihînin cihê ku li wê heyberê digere, rêbertiyê jê re dikin an jî rê nîşanî wî didin.(pênase: rêwîtiya di navbera du qraliyetan de, rêwîtiya bi rêberekîre, sembol G)

16.Leheng û êrişkar di pevçûnekê de tên li dijî hev. (pênase: pevçûn, sembol H)

17. Leheng nîşaneke taybet peyde dike. (pênase: nîşana taybet, sembol I)

18. Êrişkar têk diçe.(pênase: serkeftin, sembol J)

19. Xerabiya ku di serî de pêk hatibû ji holê tê rakirin an jî kêmanî tê dabînkirin. (pênase: dabînkirin, sembol K)

20. Leheng vedigere. (pênase: veger, sembol ↓)

21. Leheng tê şopandin. (pênase: şopandin, sembol Pr)

22. Diçin alikariya leheng. (pênase: alîkarî, sembol Rs)

23. Leheng nasnameya xwe vedişêre vedigere welatê xwe an jî diçe welatekî din. (pênase: nasnameya xwe veşartin û hatin, sembol O)

24. Lehengekî derewîn angaştên bêbinyad dike. (pênase: angaştên bêbintar, sembol L)

25. Karekî dijwar ji bo leheng tê pêşniyazkirin. (pênase: karê dijwar, sembol M)

26. Karê dijwar tê pêkanîn. (pênase: pêkanîna karê dijwar, sembol N)

27. Leheng tê naskirin. (pênase: nasîn/nasbûn, sembol Q)

28. Nasnameya rast ya lehengê derewîn, êrîşkêr an jî xerab eşkere dibe.(pênase: eşkerekirin, sembol Ex)

29. Leheng dibe xwedî dirûvekî nû. (pênase: dirûv guhertin, sembol T)

30. Lehengê/a derewîn an jî êrişkar tê cezakirin. (pênase: cezakirin, sembol U)

31. Leheng dizewice û diçe ser text. (pênase: zewac, sembol W).(Demir.2016).

BEŞA DUYEM

2. METNA ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ

Yek hebû kes ji Xwedê mestir tune bû. Bizinek cotikek karê wê hebû, carê diçû zozên diçêriya û dihate karikê xwe dahn dikir. Îjar carê bizinê wenî bang karikê xwe dikir û digot:

– Tiltilîş, Bilbilîş, dêya we çû zozana, xwar pelê qizwana, şîr ket xerfê guhana werî dahna.

Gur jî lê gohdarî dikir. Gur jî tê hinda Tiltilîş û Bilbilîş dibê:

– Ez dêya we me.

Dibên:

– Dengê te qalind e, ne wek yê dêya me ye.

Dibên:

– Hela lingê xwe rê me bide.

Gur lingê xwe rê wan dide.

Dibên:

– Lingê te reş e, ne wek yê dêya me ye.

Dihare lingê xwe boyaxa sipî tê dide û wek ê bizinê dike û nîşanî wan dide.

Dibên:

– Nigê xwe derxe hela.

Nigê xwe derdixîne, sipî dike. Karik lê dinêrin, yek dibê:

– Em derî venakin, dengê wî tam ne wek yê dêya me ye.

Yek ji wan dibê:

– Na dêya me ye, way lingê wê sipî ye.

Û gur jî dîsa dibê:

– Tiltilîş, Bilbilîş, dêya we çû zozana, xwar pelê qizwana, şîr ket xerfê guhana werî dahna.

Û derî vedike, her du cotikê karika dadiqurtîne. Dêya wan tê karikê wê tune ye. Zani ku gur werê kirîye. Dihare qoçê xwe tûj dike û di zikê gur re radike, zikê gur diçirîne, karikên xwe jê derdixe û her du karikên xwe tîne, tê malê. Meseloka min va di vir de qediya (Özdoğan,2020-Hevpeyvîn).

2.1. ANALÎZ

1- Bizin ji mal derdikeve (Pênase: dûrketin, sembol ß).

2- Bizin ji mal derdikeve û diçe zozanan diçêre ji boy ku şîr di guhanên wê keve (Pênase:çûyin, sembol ↑).

3- Gur li bizinê û karên wê guhdar dike(Pênase:lêpirsîn, sembol ε).

4-Gur fêr dibe bizin çawa bangî karên xwe dike (Pênase:berhevkirina agahiyan, sembol ζ).

5- Gur dengê xwe dişibîne yê dêya karan, lingê xwe di boyaxa sipî dadike û herî dawî jî bangkirina dêya wan teqlît dike (Pênase:xapandin, sembol η).

6- Karik tên xapandin û dihêlin ku gur têkeve hundir (Pênase: tevlîbûna tawanê, sembol θ).

7- Gur her du karikan dixwe (Pênase:xerabî, sembol A).

8- Bizin êrîşî gur dike û şer dikin(Pênase: pevçûn, sembol H).

9- Bizin qoçê xwe di gur re radike û gur dikuje (Pênase: cezakirin, sembol U).

10- Bizin karikên xwe ji zikê gur derdixe, gur dikuje û bi ser dikeve(Pênase:serkeftin, sembol J).

2.2. ŞEMA: ß ↑ ε ζ η θ A H U J

2.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ

1. Êrîşkar: Gur.

2.Baxişker: tune ye.

3.Alîkar: tune ye.

4.Şahbanû (kesê ku lê tê gerîn): tune ye.

5.Şandyar: Tune ye.

6.Leheng: Bizin

7. Lehengê sixte: lehengeke sixte di vê çîrokê de tune ye.

2.4. VEBÊJERA ÇÎROKA TILTILÎŞ Û BILBILÎŞ

Fatma Özdoğan di sala 1983yan de li gundê Selmê yê Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê hatiye dinyê. Malbata wê bi karên çandiniyê debara xwe dike. Fatma keça herî mezin ya malbatê ye. Du heb xuşk û du heb birayên wê hene. Dibistana Seratayî qedandiye. Çîrokên ku dibêjin ji dayik û pîrika xwe bihîstine. Niha jî li gundikê Peyamlê yê girêdayî Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê dijî (Özdoğan,2020-Hevpeyvîn).

3. METNA ÇÎROKA HEBHINARKÊ

Yek hebû kes ji Xwedê mestir tunebû û ez dikim meselokekê bivêm. Pîrekek hundiro dimale, hebek hinar li erdê dibîne. Dibê wele keçikek min çê bibe ez ê navê wê bikim Hebinarkê û jinik bi halkî ye. Bi rastî jî keçikek wê çê dibe û navê wê dike Hebinarkê. Keçîka xwe hinekî mezin dike û dêya keçikê dimire. Radibe bavê wê jinek din tîne. Dêmarya keçikê çêdibe û ji keçikê re dibê ez ê te bişînim hejika. Û keçikê dişîne hejika, çêlikekî mara digire û dixe nava şelbikê avê û keçik tê keçik tî bûye. Dêmariya wê nok daye keçikê çunkî. Keçik ji wê de tê pir tî ye. Hevalê wê jî dibên:

– Ka avê bide me.

Dêmariya wê dibê:

– Na wele ez avê nade we kesî, ez ê bide keçika xwe Hebhinarkê.

Û keçik avê vedixwe û dibê:

– Yadê tiştek di qirika min de maye.

Dêmarî dibê :

– Na qîza min, qilçix e qey.

Dibê:

– Avê vexwe yê here.

Û keçik vedixwe, zikê keçikê mezin dibe. Dêmariya wê ji bavê wê re dibê:

– Wele qîza te tiştini nebaş kirîye loma zikê wê wenî mezin bûye.

Dibê:

– Qîza xwe bive bikuje.

Û ji bavê wê re dibê wê bibe nava çakî(çayekî) bikuje û were. Bavê wê jî dibe nava çayekî. benda keçikê ye ku di xew re here, destê wî lê nagere qîza xwe bikuje. Keçik di xew re dihare û bavê wê xwe jê vedidize û tê malê.

Jina wî dibê : Te kuşt?

Bavê wê dibê:

– Erê min kuşt.

Û keçik dibe sibe vir de dihare, wê de dihare, digrî bavê wê tune ye. Keçik dawiyê verdişe mar û çêlikê mara ji qirika wê derdikeve û keçik dihare ser çem av mavê li ser çavên xwe dike. Lawê axê jî tê bergîrê xwe li ser çem av bide. Şoqa keçikê heye, şoqa keçikê bergîr vediciniqîne. Mêrikê axê dibê çima bergîrê min avê venaxwe. Lê dinêre keçikek e. Ji keçikê re dibê:

–Tu hatîyi ka tu çi ins i, çi cins i tu hatiyi vira?

Keçik dibê wele hal û mesela min wenî ye, ez wanî bûme.

Lawik dibê:

– Temam ez ê te bikim, dibê tu li vira bisekini, heya ez her û wer im, ez ê te bivim.

Û hinekî aşiq(mutrib) çima di wir re derbas nabe, dibên:

– Tu ji bo çi li vira ye.

Hebhinarkê dibê:

– Wele ez li benda lawê axê me, wê min bike.

Û vana radibe gurzek derzî di paş hustê wê re radikin, wê dibin li ciyekî vedişêrin, ji bo ku gava lawê axê bê Hebhinarkê ne li ser çem be. Û li benda lawikê axê dimînin,keçik bangî lawê axê dike dibê:

– Wele ez im.

Dibê :

– Ez Hebhinarkê me.

Lawê axê dibê:

– Çima lêvê te werê qelişî ye?

Dibê:

– Hingî ez ji bo te li ber tavê mame û ez giriyame lêvê min tev qelişî ye, ez li ber tavê mame ez reş bûme.

Û lawê axê dibê:

– Hadê ez ê te bivim û ez ê te bikim.

Keçika aşiq(mitrib) dibe. Hinekî wê de dihare û heşê Hebhinarkê tê serê wê, radibe ser xwe tê û bang lawê axê dike, dibê:

– Ez im.

Dibê:

– A ku te bike ez im, ne ew e.

Lawê axê we ya hemd di bergîrê de wer dike û Hebhinarkê dibe, bi wê re dizewice. Hebhinarkê dibê:

– Bavo histiyê mara têkeve lingê te dermanê te tune be, dibê hew dermanê te di destê min de be.

Û birajî histîyê mara dikeve lingê bavê wê, însan dibên li filan gundî pîrekek histiyê mara derdixe. Û bavê wê tê wî gundî, histiyê mara ji lingê bavê xwe derdixe, dibê:

– Bavo ez qîza te Hebhinarkê me. Xwe davên ser hev u du û digirîn û meseloka min di vir diqede (Özdoğan,2020-Hevpeyvîn).

3.1. ANALÎZ

1- Hebhinarkê ji mal dûr dikeve diçe hejika (Pênase: dûrketin,sembol ß)

2- Dêmarîya Hebhinarkê wê dixapîne û di şerbikê ku çêlikê mara tê de ye avê dide wê (Pênase:xapandin, sembol η).

3- Hebhinarkê tê xapandin û ava ku çêlikê mara tê de bû vedixwe .(Pênase: tevlîbûna tawanê, sembol θ).

4- Dêmarîya Hebhinarkê bêbextîyê dixe situyê wê. Ji bavê Hebinarkê dibêje qîza te tiştekî xerab kiriye wê bikuje. Bav jî ji ber vê keça xwe dibe li nava çiyayekî berdide û tê (Pênase: xerabî, sembol A).

5- Hebhinarkê û bavê xwe ji mal derdikevin diçin nava çiyayekî (Pênase:çûyin, sembol ↑).

6- Mitrib pirsan ji Hebihinarkê dike (Pênase: lêpirsîn, sembol ε).

7- Mitrib derheqê Hebhinarkê de agahîyan ji wê distîne û fêm dike ku li ber kaniyê li benda lawê axê ye (Pênase: berhevkirina agahîyan, sembol ζ).

8- Hebhinarkê û Mitrib li hev rast tên û van mitribana gurzek derzî di paş situyê wê re radikin û Hebhinarkê ji ser heşê xwe ve dihare (Pênase: pevçûn,sembol H).

9- Keça Mitrib bi derewan dibêje Hebhinarkê ez im û xwe dixe dewsa wê (Pênase: angaştên bêbintar, sembol L).

10- Gava ku Hebhinarkê bang lawê axê dike, lawê axê dibîne ku ya li ser hespa wî ne Hebhinarkê ye keça mitrib e (Pênase: eşkerekirin, sembol Ex).

11- Lawê axê fêm dike keça mitrib ne Hebhinarkê ye û wê ji ser hespa xwe davêje (Pênase: cezakirin, sembol U).

12- Keça Mitrib têk diçe (Pênase: serketin, sembol J).

13- Lawê axê bi Hebhinarkê re dizewice (Pênase: zewac, sembol W).

14- Hebhinarkê hemî rastiyan ji bavê xwe re dibêje (Pênase: dabînkirin, sembol K).

3.2. ŞEMA: ß η θ A↑ ε ζ H L Ex U J W K

3.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA HEBHINARKÊ

1. Êrîşkar: Dêmarî,Keça Mitrib.

2.Baxişker: Bavê Hebhinarkê

3.Alîkar: Lawê axê

4.Şahbanû (kesê ku lê tê gerîn): Hebhinarkê li mala xwe digere.

5.Şandyar: Dêmarî.

6.Leheng: Lawikê axê

7. Lehengê sixte: lehengeke sixte di vê çîrokê de tune ye.

3.4. VEBÊJERA ÇÎROKA HEBHINARKÊ

Sureyya Özdoğan di sala 1965an de li navçeya Wêranşara girêdayî Riha yê hatiye dinyê. Dibistan nexwendiye. Ji malabateke debara xwe bi bazirganiyê dike hatiye. keça tenê ya malê ye û heft heb birayên wê hene. Niha zewicandi ye û bermaliya malê ye. Sê heb keç û du kurên wê hene. Li gundikê Dêrika Çiyayê Mazî yê girêdayî Mêrdînê dijî. Çîroka Hebhinarkê ji dayika xwe bihîstiye (Özdoğan,2020-Hevpeyvîn).

4. METNA ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ

Hebû tunebû, qîzikekî sêwî hebû, bi zarokên gundiyan re ji xwe re diçû ber berx, karik û golikan. Rojekê li ber berx, karik û golikan yekê ji zarokan tir kir û ketin nîqaşa tirê.

Her yekê bi qaydeyekî sond xwar, yekî bi serê birayê xwe, yekî bi serê golika xwe yê çar sond xwar, gotin me tir nekiriye.

Baş e kê kir?

Gotin; hebe tunebe qîzika sêwî kiriye.

Qîzika sêwî kûr kûr giriya û hate malê.

Ji dayîka xwe re got dayê; çima birayên min tune ne?

Dayîka wê got çima dipirsî qîza min?

Qîzikê got; Îro li ber golikan yekî tir kir û kirin stûyê min.

Her yekî bi serê birayê xwe û golikên xwe sond xwarin û yê min ne bira û ne golik hebû ez sond bixwîm.

Dayîka wê got; Qîza min, heft birayên te hene li piştа heft çiyan e.

Qîzikê got; Ez ê çawa bikaribim birayên xwe bibînim?

Dayîkê got: Ez ê ji te re kerekî guşguçê çêbikim, te siwar bikim û here birayên xwe bibîne.

Heta tu çûyî gel birayên xwe ji kerê re guçguç bêje, nexwe tu bêjî şoş wê kera te xira bibe tu dê nikaribî xwe bigînî wan.

Dayîka wê jê re kera guçguçê çêkir û wê verê kir.

Qîzik qederekî rê çû û rastî kevirekî mezin hat, mêze kir moriyekî sor li bin kevirê dît û ji kera xwe re got şooooşşş!

Ker xira bû!

Vegeriya hate malê, ji dayîka xwe re got hal û mesele wisa.

Dayîka wê rabû dîsa jê re kera guçguçê çêkir û wê bi rê kir.

Li qîzikê temî kir got heta tu neçî gel birayên xwe ji kerê re nebêje şoş!

Qîzik çû, çû, çû gihaşte pişta heft çiyayan. Mêze kir erê, qesrekî wek ya qral û padîşayan li serê çiya heye.

Çû qesrê mêze kir ku tu kes tê de tuneye.

Derî vekir kete hundirê qesrê mêze kir bi dehan goştê kew û keroşkan di binê mikebê de hene..

Rabû goştê kew û keroşkan pijand û peht û ji birayên xwe re amade kir û xwe kire kuwarê veşart.

Qederekî qediya, bû êvar, mêze kir birayên wê ji nêçîrê hatin.

Birayên qizikê nêçîrvan in û her roj diçin nêçîra kew û keroşkan.

Birayê wê mêze dikin mal paqij e, li hev danandî ye û şîva wan çêkirî ye heyirî dimînin!

Heft roj û heft şev bi vî qaydeyî didome lê qîzikê nabînin û nizanin bê ka kî vê hazirî û paqijiyê ji wan re dike.

Birayê wê biryar digirin ku rojê yek li malê nobedarî bike.

Roja ewil birayê wê yê mezin ji bo meseleyê fêm bike naçe nêçîrê.

Ji şeş rojan carekê birayek nobedarî dike lê ji ber xewa wan tê kes qîzika paqijiya malê dike nabîne.

Roja heftan, birayê piçûk li mal dimîne. Pêçiya xwe ya qilîncê diqelêşîne û xwê dike birîna xwe ku xewa wî neyê.

Birayê piçûk jî wekî yê din di xewê de diçe, qîzik radibe malê dide hev û dike xwe bavêje kuwarê, bira ji xewê radibe û qîzikê dibîne.

Bira dibêje; Tu kî yî, çi kes î, çima vê xizmetê ji me re dikî û xwe berşê didî?

Qîzik dibêje: Weleh birako ez xuşka we me.

Hal û meseleya xwe û zarokên gundiyan dibêje ji birayê xwe re û bi hesreta salan rûdinin .

Piştre birayên din jî, ji nêçîrê tên û xwişka xwe dibînin.

Roja din, hinek mewij didin xwuşka xwe û lê temîn dikin ku rojê mewijekî bide pisîkê ku neçe mîza xwe li agirê malê neke netefîne û bêagir nemînin.

Qîzik, rojekê xwe ji bîr dike û mewijê nade pisîkê, pisîk diçe bi ser agir de mîz dike û agir ditefîne.

Qîzik, xwe diqeherîne, xemgîn dibe, dibêje birayên min wê werin ji min re gotinan bêjin, ez ê çi bersiva wan bidim. radibe bi ser qonaxê dikeve û mêze dike ji dûr ve dûmanekî radibe, bi qasî roniya çireyekî dûr xuya dike, dibêje heta birayên min werin ez ê biçim ji wir agir bînim.

Xwe li dûyê agir digire û diçe.

Diçe, mêze dike malekî ye û dûman ji malê radibe.

Li ber şibakê dinêre ku hûtekî heft serî ye di hundir de û heft qîzê wê hene, her yekî ji aliyekî de ketine ser serên wê û sipiyan ji serê wê dertînin û dikujin.

Piştre ku hûta heftserî radize, qîzik xwe bi wan nîşan dide.

Qîzên hûtê, ji qîzikê re dibêjin tu kî yî çi kes î?

Qîzik, meseleya xwe û rewşê ji wan re dibêje ku ji bo agir hatiye.

Qîzên hûtê jê re dibêjin tu çi qîzikekî rind û bedew î, vêga diya me razayî ye ku ji xewê rabe te bibîne wê te weke loqmeyekî bide ber diranên xwe û bixwe.

Qîzên hûtê, tevî agir, qalibekî sabûn, hebekî şe û kundekî herî didine qîzikê û jê re dibêjin here.

Dibêjin ku diya me li dû te hat, her carê yekî li dû xwe bavêje. Sabûn dê bibe cebl, herî bibe çamûr û şe dibe dirik û istrî.

Hûta heftserî ji xewê radibe, çavsor dibe û dibêje bêhna merivan tê. Hût dike ufe uff û kufe kuffa wê, radibe bi dû qîzikê dikeve.

Diçe, diçe, diçe, û nêzîkî li qîzikê dike, her cara nêzîkî lê dike, qîzik tiştekî davêje pêşiya wê.

Hasilî kelam xwe digîne malê.

Derî li ser xwe digire û dikeve hundir.

Hûta heftserî, ji qîzikê re dibêje di terka derî de pêçiyekî xwe derxîne bi soz ez ê bi tenê li pêçiya te bimijim û ez ê te nexwim.

Her roj bi vî qaydeyî, hûta heftserî tê li pêçiya wê dimije û diçe.

Roj bi roj qîzik dihele û diqede êdî li ser piyê xwe nasekine.

Birayên wê ferq dikin ku xwişka wan her diçe zehîv dibe û jê dipirsin, ka çi bi serê wê de hatiye?

Qîzik ditirsê ku ji birayên xwe re rewşê bêje. Birayên wê zorê didinê û bêçare meseleya xwe ji wan re dibêje.

Birayên wê radibin diçin hûta heftserî dikujin û her heft qîzên wê ji xwe re tînin.

Yek ji qîzên huta heftserî, ya mezin ji qîzikê qicix digire.

Rojekê qîzik kar dike û aciz dibe ji bûka mezin re dibêje hinek av bide min?

Bûk zelûyekî biçûk dixîne mesîna avê û dide qîzikê.

Qîzik avê vedixwe û zelû di qirika wê de dikeve zikê wê û dibe mar.

Dem û demsal derbas dibin, her ku diçe zikê qîzikê mezin dibe.

Birayên wê mereq dikin dipirsin ev çi rewş e?

Bûka mezin dibêje; weleh xwişka we ducanî ye lewra zikê wê werimiye.

Eman yeman çawa ducanî ye?

Radibin li hev dicivin, bûka mezin ji mêrê xwe re dibêje, wê bibe pişta çiyayekî bikuje û were.

Birayê wê radibe, xwişka xwe dibe pişta çiyayekî ku wê bikuje lê destê wî naçe xwişka wî ku wê bikuje.

Dibêje xwişka min; de ka serê xwe bide ser çoka min û hinek razê!

Qîzik, serê xwe dide ser çoka kekê xwe û radizê. Kekê wê bi dizîka çoka xwe ji bin serê wê radike, wê dihêle û vedigere malê.

Tê ji bira û bûkan re dibêje min wê kuşt!

Piştî qîzik, bi xwe dihese, mêze dike bira filan tune, cihekî xir û xalî ye, ne his û ne cins!

Qîzik, nifiran dike û dibêje; Birako, birako tu biçî di nîvê rê de sincekî di linga te biçe, “ner der bo, ne zer bo, heta destê min pê nebo”

Bira tê û di rê de sinc di linga wî de diçe û bi kulekanî tê malê.

Çendî bi halê xwe û birîna sincê dimîne.

Qîzik, tî û birçî dibe, mêze dike li jêrê çiya erdekî heye weke dêrxeydê, dinêre ku cotyarekî li wir cot dike.

Xwe lê digire û diçe.

Diçe binê dirikekî mêze dike marekî di binê dirikê de ye weke jidya, marê zikê wê jî ji tîna dike wehre wehr ku derkeve der.

Marê binê dirikê dike qurequr û yê zikê wê dike qurequr weke ji hev re alan bidin.

Qîzik çawa quriçê ser avê dibe mar ji zikê wê derdikeve derve.

Cotyar qîzikê dibîne û tê dipirse; ka tu kî yî, çi kes î?

Qîzik, ji cotyar re jî rewşa qewimiyê ji serî heta binî dibêje.

Cotyar jê re dibêje, piştî wisa ye, were bibe bermaliya min?

Qîzik daxwaza wî qebûl dike û hevdû mar dikin.

Zêde hindik, dem û demsal derbas dibin, rojekê qîzik li ber tenûrê ye û nan dipêje.

Mêze dike, jinikekî bi serê kerê girtiye û siwarekî kulek lê kiriye û wî digerîne.

Qîzik, bang li jinikê dike, dibêje; hûn kî ne çi kes in, li çi digerin, werin ez hinek nanê germ bidime we!

Qîzik, wan nas dike.

Jinik û mêrê xwe tên, jinik dibêje; ev bû heft sal mêrê min sinc di lingê wî de çûye û ne der dibe, ne zer dibe, derd û dermanê wî qediya li dinyayê.

Qîzik, dibêje de ka werin siya darê rûnin, nanekî germ bidim we bixwin ez jî derziya xwe di birîna mêrê te de bidim.

Jinik bi tinaz û henek dibêje; e he! nema cîh me wî gerandin xweş nebû wê bi derziya te xweş bibe!

Qizik, radibe derziya xwe tê de dike di nab nîm û xwînê de sincê ji lingê wî dertîne.

Mêrik dibêje; xwişka min Xweda ji te razî be, ev bû heft sal bi vê birîna bê derman re têdikoşiyam çare tune bû, te min sipî sax kir.

Qîzik dibêje; ew xwişka te ya ku te bir li serê çiya berda ez im.

Meseleya xwe û bûkê ji birayê xwe re dibêje û radibin, çaqekî jinikê bi hespekî tî ve, hebekî bi hespekî birçî ve girê didin û hespan berdidin deşta Dêrxeydê.

Her hespekî bi aliyekî ve diçe û jinikê ji hev dikin davêjin û têne malê ber birayên xwe.

Paşgotin..

"Xebroşka me li diyaran, rehme li dê û bavê hazir û gohdaran." (Zel,2018)

4.1. ANALÎZ

1-Qîzika sêwî û diya xwe di gund de tenê dijîn (beşa destpêkê, sembol a)

2- Gava hevalên Qîzika Sêwî bi serê birê xwe sond dixwun ew ji diya xwe re dibê çima ê min birayê min tuneye (fonksîyona yekem ya baxişker,sembol D)

3-Piştî ku qîzika sêwî dielime birayên wê hene biryara çûyina cem wan dide (destpêka çalakiya hember, sembol C)

4-Qîzika sêwî ji boy birayê xwe bivîne ji mal derdikeve(dûrketin, sembol β)

5- Qîzika sêwî ji mal der dikeve (çûyin, sembol ↑)

6- Diya wê jê re kerê guçguçî çêdike (standina alava bisêr, sembol F)

7-Qîzika sêwî divê ji kerê xwe re nebêje şoş, divê nehêle agir bitefe (qedexe ,sembol γ)

8-Qîzika sêwî ji kerê re dibê şoş, agir ditefîne (binpêkirina qedexeyan, **δ**)

9- Hûta heftserî ji xewê radibe, çavsor dibe û dibêje bêhna merivan tê (lêpirsîn, sembol **ε)**

10-Hûta Heftserî dixwaze Qîzika Sêwî bixwe (nebaşî, sembol A)

11- Hûta heftserî, ji qîzikê re dibêje di terka derî de pêçiyekî xwe derxîne bi soz ez ê bi tenê li pêçiya te bimijim û ez ê te nexwim , bi vî rengî wê dixapîne û her roj wê dihelîne(xapandin,sembol **η**)

12- Qîzika sêwî tê xapandin û dihêle ku hût her roj tiliya wê bimêj e (hevparîya sûc,sembol **θ**)

13-Qîzika Sêwî gava ji bo anîna agir diçe mala Hûta Heftserî bi wê re rû bi rû dimîne (pevçûn, sembol H).

14- Qîzên hûtê, tevî agir, qalibekî sabûn, hebekî şe û kundekî herî didine Qîzika Sêwî (nîşana taybet, sembol I)

15- Hûta heft serî ji alîyê birayên Qîzika Sêwî ve tê kuştin (serketin,sembol J)

16- Birayên Qîzika Sêwî wê ji hûta heftserî xellas dikin (alîkarî, sembol Rs)

17-Qîzika Sêwî xwe bi bira û jina wî dide nasîn û ew wê nas dikin (nasîn, sembol Q)

18- Qîzika Sêwî ji alîyê Hûta Heftserî tê şopandin (şopandin, sembol Pr)

19- Hûta Heftserî û jinbira Qîza Sêwî tên kuştin (ceza kirin, sembol U)

20- Qîza Sêwî bi cotkar re dizewice (zewac, sembol W)

21- Dema ku Qîzika sêwî hemî rastiyan ji birayê xwe re dibêje bêsûcî ya wê tê fêmkirin (dabîn kirin,sembol K)

4.2. ŞEMA: a D C β ↑ F **γ δ ε** A η θ H I J Rs Q Pr U W K

4.3. LI GOR HEFT KARAKTERÊN PROPP ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ

1. Êrîşkar: Hûta Heftserî

2.Baxişker: Qîzên Huta Heftser

3.Alîkar: Birayên Qîzika Sêwî

4.Şahbanû (kesê ku lê tê gerîn): Qîzika Sêwî li birayên xwe digere.

5.Şandyar: Diya Qîzika Sêwî

6.Leheng: Qîzika Sêwî

7. Lehengê sixte: lehengeke sixte di vê çîrokê de tune ye.

4.4. VEBÊJERÊ ÇÎROKA QÎZIKA SÊWÎ Û HÛTA HEFTSERÎ

Mordem Zel, niviskar, lêkoliner, û wergêrê kurdî ye. Di sala 1975an de li gundê Husênîk dê girêdayî navçeya Licê ya Amedê hatiye dinyê. Dibistana seretayî li gundê Husênikê xwandîye. Ji ber bûyerên salên 1980yî û destpêka salên 1990î derfeta wî ya xwendinê çênabe.Piştî bûyerên salên 90î bi malbatî koçî bajarê Amedê dikin. Demeke dirêj li Stenbolê di nav karê hunera muzîkê de dixebite. Di sala 2007an de vedigere Amedê û bi kar û barên ziman û edebîyatê re eleqedar dibe. Mordem Zel ji sala 2011an û vir de li ser çand û hunera kurdî lêkolînan dike. Heta niha bi dehan çîrok, serpêhatî û stranên gelêrî yên di arşîvan de cîh negirtine berhev kirîne. Bi dehan gotarên wî yên li ser çand û dîroka Kurdistanê li ser malpera Amîda Kurd hatine weşandin, hetanî niha du berhem ji zimanê tirkî wergerandîye zimanê kurdî. Mordem Zel,niha li Amedê dijî û xebatên xwe yê çand û edebîyatê didomîne. Di heman demê de Zel, yek ji endamê Koma Helbestê ya Amedê ye.

ENCAM

Divê xebatê de min li gor 31 fonksiyon û heft karakterên ku Propp diyar kirine çîrokên wek: Tiltilîş û Bilbilîş, Hebhinarkê, Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî analîz kirin. Di rêbertiya şêwaza Propp de min hewl da xwe bigihînim ew 31 fonksiyon û 7 karekteran. Weke ku Propp jî diyar dike, dibe ku ew 31 fonksiyon hemî di çîrokê de peyde nebe, lê di hemî çîrokan de heman rêz têye şopandin. Di çîroka Tiltilîş û Bilbilîş de min xwe gîhand 10 fonksîyon û 2 karakteran, di çîroka Hebhinarkê de 14 fonksiyon û 6 karakteran û herî dawî jî di çîroka Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî de jî ez gîham 20 fonksiyon û 6 karakteran. Di encama vê xebatê de min rêbaza Propp li ser sê çîrokên kurmancî ceriband û min dît ku angaşta Propp xwedî bintar e û ev angaşt çawa ku di çîrokên navnetewî de dikare bêye îspat kirin,di heman demê de dikare di çîrokên kurdî de jî xwe eşkere bike. Ez hêvîdarim ev xebat, rê li ber xebatên bi vî rengî veke û ji bo xebatên bi vî rengî bibe alîkar.

ÇAVKANÎ

Yildirm, K., Pertev, R., Aslan, M. (2013). Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî (Çapa 1.).Stenbol: Mardîn Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Başaran, C. B., Çalışkan, Erol, Ş. S.(2017).Vlademir Propp'un Biçimsel Yaklaşımından Hareketle Yozgat'tan Derlenmiş "Ercin Masalı" Üzerine Bir inceleme.Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi.Cilt 10.Sayı 50. 1307-9581.

Zel, M.(2018).Qîzika Sêwî û Hûta Heftserî. http://candname.com/qizika-sewi-u-huta-heftseri/ Dîroka gîhaştina sîteyê:15.05. 2020.

Demir, Bunyamin.(2016). Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stitih Thompson (Bi nûmûneyên Çîrokên Mîrza Mihemed).Zanîngeha Mardin Artuklu.Mêrdin.Teza Lîsansa Bilind ya çap kirî. https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/ Dîroka gîhîştina sîteyê: 19.05.2020.

Kuzucular,Ş.(2013).Masal İnceleme ve Propp Yöntemi.https://edebiyatvesanatakademisi.com/anonim-edebiyat-mizah-hiciv/masal-inceleme-ve-propp-yontemi/980 Dîroka gîhîştina sîteyê.19.05.2020.

Derleme.(2010). Vladimir Propp https://www.msxlabs.org/forum/edebiyat-ww/313333-vladimir-propp.html. Dîroka gîhaştina sîteyê 02.12.2020.

Keskîn, N.(2019) .Folklor û Edebiyata Gelerî.Stenbol: Weşanên Avesta.

Hevpeyvîn

Özdoğan, F., 15.11.2020.

Özdoğan, S., 15.11.2020.